Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar :1081 12-Tîrmeh- 2023 www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
nameronahi@gmail.com
☎ 423165

# Li Iraqê peykerek a Xwedawenda Starê hate dîtin



**Li bajarê kevnar ê Asûrî Nemrûd yê li Iraqê, peykerekî Starê (Îştar) hat dîtin.**

Li bajarê kevnar ê Asûrî Nemrûd ê li Iraqê, kevirekî monoment yê mezin ku peykerê Star (Îştar) li ser hatiye verotin, ji binê erdê hat derxistin.

Ev monoment bi hevkariya Arkeologên Zanîngeha Muzeya Arkeolojî û Antropolojiyê ya Pennsylvaniayê û tîma arkeologan a Iraqî ve hatiye dîtiye. Di dema êrişên çeteyên DAIŞ'ê de bajarê kevnar Nemrud zererek mezin dîtibû. Li bajêr di nava tiştên vedîtî de îbadetxaneyeke ji bo Starê ya bi dirêjiya 3 hezar salî jî heye.

Hêjayî gotinê ye ku heman tîma lêkolînê beriya niha jî qesreke 2 hezar û 800 salî derxistibû holê. Qesr a melikekî Asûrî yê bi navê Adad-Nîrarî yê Sêyem bû ku di salên B.Z. 810-783 ji 810 hikûm dikir.

Li gorî texmînan hem qesr û hem jî îbadetxane di B.Z. 612´an de piştî hilweşandina împaretoriya Asûrê, hatine şewitandin.

# Dema zarok zêde li ber ekranê bimînin, mejiyê wan tê guhertin


**Li Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê (DYA) li ser zarokan lêkolîneke berfireh hate kirin. Di lêkolînê de hate diyarkirin ku zarokên zêde li ber telefon, tablet û lîstikên vîdeoyê dimînin, di mejiyê wan de guherîn pêk tê.**

Li gorî lêkolîneke Enstîtuya Tendirustiya Neteweyî ya Amerîkan (NIH) zarokên ku ji 7 saetan zêdetir li ber telefon, tablêt û lîstikên vîdeoyê dimînin, di mejiyê wan de guherîn pêk tê.

Di vê lêkolînê de li ser 4 hezar û 500 zarokên 9-10 salî hate sekinandin. Di lêkolînê de derket holê ku di mejiyê zarokan de dopamîn zêde dibe ya ku hesta xweşbûnê ava dike. Di lêkolînê de li MR'an hate nihêrin û derket holê ku di mejiyê zarokan de şopên cihê tên dîtin.

Dr. Gaya Dowlîng ya ku di lêkolînê de cih girtibû, diyar kir zarokên ku zêde li ber tablet û telefonan dimînin serebral korteksa wan zûtir zirav dibe. Serebral korteks, zanînên ku ji 5 loban tê dinirxîne. Dowlîng diyar kir ku ziravbûna serebral korteksê tê wateya kalbûn û pîrbûnê û bal kişand ser vî tiştî ku hê wan fêm nekiriye ku ev ji bo zarokan baş e yan na.

Di çarçoveya lêkolînê de dema ku 11 hezar zarokan li hesabên înstagramê nihêrîne, MR'ên mejiyên wan hatine kişandin. Di lêkolînê de tê diyarkirin ku daxwaza bikaranîna medyaya civakî ji pêdiviya eleqebûna bi xwe re wêdetir, bi awayekî hîsterîk û ji nişka ve pêk tê.



# 78 hezar bizmar û 5 hezar metre ta

Dema şêwekarek portreyekî xêz dike yan jî çêdike, malzemeyên ku pêşî tên hişê mirov boyax û qelem in. Lê hinek hunermendên afirîner hene ku bi malzemeyên cuda jî dikarin portreyan çêkin. Ben Koracevîc ê li Londonê, bi ta û bizmaran portereyekî lîstikvan Cillian Murphy çêkiriye. Cillian Murphy ew lîstikvan e ku bi karakterê xwe yê Tommy di rêzefilmê "Peaky Blinders"de derket pêş û hat naskirin.



Ben Koracevîc, ev çend sal in ku bi malzemeyên weke ta û bizmaran îllûstrasyonên rasteqîn çêdike. Ew demeke dirêj li ber karên xwe dixe. Karê wî yê dawî jî ji portreyekî bêhtir, peykerek e. Peykerekî ku bi ta û bizmaran hatiye çêkirin. Wî ji bo vî karê xwe 78 hezar bizmar bi kar anîn! Dema mirov berê xwe dide bizmarê li ser peykerî, mirov dibîne ku wî ev kar bi hostetî pêk aniye û peykerekî cihê afirandiye. Heta niha ji bo vî peykerî 5 hezar metre jî ta bikaraniye. Wî ev peykerê xwe di heman demê de bi awayekî sê ber jî sêwirandiye. Ben Koracevîc portreyan bi hurgilî çêdike. Wî da zanîn ku piştî peykerê Cillian Murphy temam bû, ew dê bi reçîneya epoksî bipêçe û bi vî awayî li pêşangehan nîşan bide.



Sudoku: Bersiv 90

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 9 | 8 | 2 | 4 | 7 | 3 | 5 | 6 | 1 |
| 4 | 1 | 3 | 6 | 2 | 5 | 9 | 7 | 8 |
| 7 | 6 | 5 | 9 | 8 | 1 | 4 | 3 | 2 |
| 2 | 7 | 8 | 5 | 4 | 9 | 6 | 1 | 3 |
| 1 | 5 | 9 | 8 | 3 | 6 | 2 | 4 | 7 |
| 6 | 3 | 4 | 2 | 1 | 7 | 8 | 5 | 9 |
| 3 | 9 | 6 | 7 | 5 | 8 | 1 | 2 | 4 |
| 8 | 4 | 1 | 3 | 6 | 2 | 7 | 9 | 5 |
| 5 | 2 | 7 | 1 | 9 | 4 | 3 | 8 | 6 |

Sudoku:Pirs 91

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | | | | 3 | 8 | 5 | | |
| | 6 | | | | 1 | | 7 | |
| 3 | | | | | 6 | 1 | 8 | 4 |
| 7 | | 2 | | | | | 9 | |
| | | 5 | | 4 | | 7 | | |
| | 1 | | | | | 8 | | 2 |
| 8 | 7 | 4 | 6 | | | | | 5 |
| | 2 | | 3 | | | | 4 | |
| | | 9 | 1 | 8 | | | | |

## Quncika Têgînan

| | |
|---|---|
| Bac | Diravên ku dewlet di berdêla mal û milk de ji welatiyên xwe distîne: Baca xaniyan pir biha ye. |
| Cirm | Standina bi darê zorê ya mal, milk yan jî diravan ji mirovan: Rêbiran em cirm kirin. |
| Firîşte | Melek. |
| Koordîne (Fransî) | Ji bo xwegihandina armancekê pêkanîna girêdan, têkilî, rêxistin û ahengê di navbera çend karan de: X. karê kargehê koordîne dike. Koordînasyon. |
| Koordînator | Kesê karê koordîneyê pêk tîne. |
| Perû | Xelat, diyarî: A. saetek da B. got; ev perûya te ye. |
| Salewext | 12 meh: X. salewext cotkariyê dike. |
| Seranser | Ji serekî heta serê din. Tev, hemû: Ez li seranserê bajêr geriyam. |
| Seresere | Xemsarî. Girîngnedîtin: X. karê xwe seresere dike. |
| Rojev | Tiştên dibin mijara rojê: Di rojeva me ya îro de êrişên dagîrkeran hene. |



# Berxwedana 14'ê Tîrmehê berxwedana şoreşa Kurdistanê ye

Siyasetmedar-nivîskarê Kurd Fûat Kav qala Rojiya Mirinê ya Mezin a 14'ê Tîrmehê kir û destnîşan kir ku şehîdên şoreşger bi wêrekî, exlaq û berxwedana xwe di çalakiyeke efsanewî de gihîştin hev. R-3

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar : 1081 12-Tîrmeh- 2023 www.ronahi.net/ku/

# KALKAN:TI QANÛN NIKARIN PERGALA ÎMRALIYÊ BIDOMÎNE



Endamê Komîteya Rêveber a PKK'ê Dûran Kalkan diyar kir ku desthilatdarên Tirk her gava ku tengav dibin zilmê li Îmraliyê, gerîla, Rojava û siyaseta demokratîk dikin û got, "Gelekî ditirsin, lê bi kêr nayê. Wê hilweşin." Kalkan diyar kir ku ger çend kesên çep, sosyalîst, rewşenbîr, demokrat û hunermend mîna rojnamevan Merdan Yanardag helwestê nîşan bidin, wê pergala rejîma Îmraliyê têk biçe.R-3





## Navenda Çandê ya Jîna Emînî



Dîdar Kamil a xwediya navendê ye destnîşan kir ku ew bi bandora serhildana Jin, Jiyan, Azadî navendek bi navê Jîna vekiriye ku ji bo jinan derfetê xwendinê vedike.R-2

## Rûpelek ji dîrokê...(2)



Bi derbasbûna sed salan ji wê peymana xwedî temenekî tije êş û elem hêjî em ferqekê di navbera kar û kiryarên Erdogan, Mistefa Kemal û Ismet Inönü de nabînin, lê dersên ku partiyên siyasî, rewşenbîrên civaka Kurdistanê û siyasetmedarên me ji wê bûyer û sed salên reş bistînin, çi ne?R-5

## Navenda Diyalîzê ji nexweşiya gurçikan re cihê çareseriyê ye

Xebatên tendurstî yên Navenda Şuştina Gurçikan ( Diyalîz) xwesteka gelê herêma Cizîrê bi vîneke xurt kar û xebatê ji bo başkirina rewşa nexweşan dikin.R-6




## Koma Çiyayê Kurmênc Parastina çanda resen e



Govendên Kurdî yek ji nirxên herî pîroz yên çanda Kurda ye, ev govend dîrokê di nava xwe de dihewîne û diparêze. Herêma Efrînê bi kal û pîrên xwe çanda govandên Efrînê vedibêjin. Berpirsê Koma Çiyayê Kurmênc Sadet Mihemed anî ziman ku erka wan parastina çanda Kurdî Ji qirkirinê ye.R-7

Nabe ku dagirkeriya Tirk bê rewakirin
Zeki Bedran R-5

Peyamên nameya M.Hayrî Durmuş
Farûk Sakik R-5

ŞOREŞA 19'ê TÎRMEHÊ XETA ÇARESERIYA ALOZIYA SÛRIYÊ YE
Dilyar Cizîrî R-4

# Şoreşê rê vekir

**Endama xebata sînemayê Sevînaz Evdikê, da zanîn ku li Rojava xebatên sînemayê roj bi roj pêşdikevin. Herweha bi Şoreşa Rojava rê derfet ji bona wan vebû û bi riya vê yekê gelek berhemên hunerî di warê sînemayê de afirandin.**

Sînemeya Kurdî li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê bi şoreşê re dest pê kir. Pêwîstî pê heye ku em çîroka derhêner û sînemavanekê vebêjin. Sevînaz Evdikê di 1992'yan de li Serêkaniyê ji dayik dibe. Di nav malbateke welatparêz û hezkiriyên hunera Kurdî de mezin dibe. Di 16-17 saliya xwe de diçe Dêrazorê û li zanîngehê beşa zarokên pêşdibistanê dixwîne. Paşê dest ji xwendina zanîngehê ku gihîştibû sala çaremîn berdide û sala 2012'an derbasî Bakurê Kurdistanê dibe. Serpêhatiya sînemayê ya sînemavan Sevînaz Evdikê, sala 2012'an li Amedê dest pê dike û bi serpêhatiyên curbicur her ku diçe bêhtir xurt dibe.

Sevînaz Evdikê gavên destpêkê yên sînemayê bi van hevokan derdibire; "Diya min nexweş ketibû, ji bo em wê bibin nexweşxaneyê, em çûn Bakûr. Min ev çûyîn ji xwe re vegerand fersendekê da ku xewnên xwe yên ji zaroktiyê ve yê di dilê min de bûn, pêk bînim. Di sala 2012'an de min berê xwe da Akademiya Cegerxwîn, min sînema xwend û sala 2015'an min xwendina xwe bi dawî kir û kurtefilmek bi navê 'Zayîn' ji bo projeya derçûnê amade kir. Kurtefilmê min behsa dayikeke ducanî û bavê wê dike, wekî ku şerê gul û bombeyan bû. Ruxmî ku kêşan û montaja wê du rojan dirêj kir jî di akademiyê de kurtefilmê herî serketî hat hilbijartin. Nêzî 8 mehan, min di gelek xebatên sînemayê de cih girt, ji çêkirina film, rêzefilm heta kurtefilman.

**Piştî akademiyê vedigere Serêkaniyê**

Rêwîtiya min li wir diqede û di dawiya 2015'an de dîsa vedigerim hembêza welat, Serêkaniyê. Di destpêka 2016'an de ligel Komîna Film a Rojava heya 2023'an xebat kir. Destpêka 2023'an min dest bi xebateke nû kir. Ev xebat Kolektîfa Kezî ya Jinên Sînemager bû. Rast e navend li Rojava ye lê belê di bin sîwana wê de xebat ji bo jinan dibin."

**Zextên rejîma Beesê ya li ser malbatê**

Malbata Sevînaz Evdikê malbateke hunerhez e. Ji lewma jî tim bûye hedefa rejîma Beesê. Sevînaz Evdikê got, "Zextên rejîma Beesê li dijî malbatê ji ber hezkirin û xebatên hunerî, her li pêş bû. Wê demê neçar mam dest bi xwendina zanîngehê beşa perwerdeyê bikim. Lê min rojekê jî jê hez nekir. Tevî ku ber bi pêvajoya dawî ya derçûnê ve diçûm, min dest jê berda, min dizanîbû ku ev ne tişta ez dixwazim e. Înîsiyatîfên ji bo bajêr hebûn, di 16 saliya xwe de xwendekarên min ên 30-35 salî yên zimanê Kurdî hebûn. Berî ku li dibistanê fêrî zimanê Erebî bibim, min zimanê Kurdî dixwend."

**Kolektîfa Kezî ji bo sînemavanên jin e**

Sevînaz Evdikê hewl dide bibe derhêner û li Rojava filman çêke. Wê da zanîn ku li Rojava sînema her bi pêş diveke û got, li Rojava filman çêdike û dixwaze bibe pispor di qada xwe de û wiha dirêjî da gotinên xwe:"Hezkiriyên sînemayê hebûn lê derfet tinebûn, kesên ku



ev xebat dikirin, dihatin binçavkirin. Bi taybetî ji bo jinan gaveke mezin bû, bi hebûna dewletê ne mumkin bû xebateke wiha bi pêş bikeve. Ji bo mêran gaveke zehmet lê ji jinan re di asteke ne mumkin de bû. Lê şoreşê rê vekir, ti rojnamevaniyê dikî ez jî filman çêdikim û gelek jin xebatên cur be cur dikin. Jinan di warê sînemayê de xwest xwe bi pêş bixin, lê yên ku dikarîbûn rê dewam kirin, hinek ji ber pirsgirêkên malbatî û hişmendiya civakî li cihekî sekinîn, lê mêr jî bûn sedem ku gelek jin gavan bi paş ve biavêjin, hewldan çêbûn. Jinan gelek xebat dan meşandin, berhemên bi nirx derketin holê û projeyên nû jî hatin destpêkirin. Şoreşê derfet ava kir ku ez filman çêkim, ne tenê ez, gelek jinên sînemavan. Bi Kolektîfa Kezî ya Jinên Sînemavan em hewl didin zemînê fêrkirinê, ku jin hîn bêhtir xwe di nav xebatên şoreşê de bibînin, ava bikin."

**Em jin bingehê şoreşê ne**

Sevînaz Evdikê da zanîn ku piştî şoreşê li Rojava bi dehan kurtefim, metrajdirêj û belgefilm hatine çêkirin û ev berhem di festîvalên navneteweyî de hatine nîşandan. Her wiha wan bi van berhemên xwe gelek xelat jî wergirtine. Sevînaz Evdikê vê rewş jî wiha dinirxîne: "Di salên dawî de Rojava gavên mezin avêtin. Bi vê yekê, em dikarin bibêjin, sînemaya Kurdî ji pêvajoya zayînê derbasî pêvajoya estetîk, naverok, çîrok û lîstikvaniyeke xurt bûye. Her wiha, di warê senaryoyê de jî bipêşketineke baş heye." Sevînaz Evdikê herî dawî got, ew xwe mîna parçeyekî şoreşê dibîne û got, "Jinên ku di dilê wan de hestên hezkirinê ji bo sînemayê hene, bila werin. Bi rastî jî ez serbilind im, ji ber ku jinek im ji Rojava, jinek û parçeyekî ji vê şoreşê me. Serbilind im bi serpêhatiyên şehîdên weke Arîn, Barîn û Nûjiyanê. Pir kêfxweş im ku min ew nas kirine. Ruhê wan yê fedayî, her tim hêz û qewet daye min." **NÛJÎNHA**

# Jin ji bona aboriya xwe ya serbixwe dixebitin

**Li Wargeha Penaberan a Şehîd Rustem Cûdî ya Mexmûrê jin rûxmê rêgirî û ambargoya ku ji aliyê PDK'ê ve tê pêkanîn, ji bo aboriya xwe ya serbixwe bidest bixin têdikoşin.**

Bi penaberiyê re ji salên 1994'an heta 2023'an jinên ji wargeha Şehît Rûstem Cûdî ya Mexmûrê rêxistinbûna xwe ava kirin. Jinan li gel xebatên ku dimeşînin, saziyên ku hatine avakirin li ser bîrdoziya rizgariya jinan ava kirin. Weqfa Jinên wargeha Şehît Rûstem Cûdî ya Mexmûrê di perwerde û rêxistinkirina kar û xebnata jinan de roleke girîng dilîzin. Her sal di qadên civakî yên cuda de ji bo jinan perwerde li dar dixin. Herî dawî jî perwerdeya dirûtinê ji bo jinan dabûn destpêkirin. Yek ji wan jinên ciwan Eylem Kara ku di dirûtxaneyê de kar dike. Ruxmê bêderfetiyên heyî jî ji bo ku hemû pêdiviyên xwe bi xwe pêk bîne kar dike qala zorî û zehmetiyên ku kişandine dike.

**'Ez fêrî gelek karan bûm'**

Eylem Kara di destpêka axaftina xwe de armanca xwe ya ji bo kar anî ziman û wiha got: "Armanca min a hatina vê derê ew e ku ez bikaribim xwe bi xwe li ser lingan bigrim. Ez bi xwe bi kêrî xwe bêm û wek jinek di aliyê madî de tiştek bigrim. Jin gelek kêm kar dikin û min jî bi xwe xwest wek jinekî karê xwe bikim. Weqfa jinan dewreyek vekir, ez jî beşdarî vê dewreyê bûm û



di wir de fêrî gelek tiştan bûm. Min jî xwest ez xwe pêş bixim û ev bi qasî 7-8 mehan e di dirûtinxaneyê de kar dikim."

**'Rêgirî û ambargo bandorê li karê me dike'**

Eylem Kara diyar kir ku gelek jin hene dixwazin di dirûtxaneyê de kar bikin lê ji ber sedema nebûna derfetan daxwazên wan pêk nayên û wiha berdewam kir: "Em destpêkê gelek bûn, ji ber ku makîne tunebûn û xira bûn, kesî jî alîkarî neda me ku em bikaribin bixebitin û di heman demê de rêgirî û ambargo bandoreke neyînî li ser karê me dike. Ji ber wê yekê tu alîkarî ji bona me nayê dayîn. Me bi qasî 20 jin perwerde dît lê ji wan tenê em 3 kes man. Ji ber ku makîne tunebûn, tiştên pêwîst tunebûn em sê kes tenê dixebitin."

**Dixwazin hemu jinan fêr bikin**

Eylem Kara destnîşan kir ku daxwaza wan a sereke ew e ku hemû jin bikaribin xwe di hemû aliyan de perwerde bikin û got: "Me gotiye ji îro û pê ve em ê dewreyên cuda vekin, em ê zêdetir jinan perwerde bikin da ku ew jî fêr bibin, ne ku bên li gel me kar bikin, ji bo ew jî di mala xwe de bin an jî li cihek din bikaribin xwe li ser piyan bigrin. Ango em ê dewreyên perwerdeyê vekin ji bona ku jinên din jî bên û bikaribin beşdar bibin. Tiştên ku jin ji me dixwazin, çi ji me tê em cil û bergên wan çêdikin ango modêlên cur be cur em çêdikin, em jî dixwazin cil û bergên wan xweşik çêbikin." **JINHA**

# Navenda Çandê ya Jîna Emînî

**Navenda nûçeyan**

**Dîdar Kamil a xwediya navendê ye destnîşan kir ku ew bi bandora serhildana Jin, Jiyan, Azadî navendek bi navê Jîna vekiriye ku ji bo jinan derfetê xwendinê vedike.**



Dîdar Kamil ku navendeke çandî ye ji bo xizmeta jinan û lêkolînên civakê vekiriye, ji şoreşa Rojhilatê Kurdistanê ya ku bi pêşengiya jinan bi dirûşma "Jin Jiyan Azadî" piştî qetilkirina dest pê kir gelek bi bandor dibe û navê navenda xwe ya çandî dike 'Jîna.' Li navenda çandê ya bi navê 'Jîna' hemû cureyên pirtûkan ên ji bo xwendin û lêkolînên civakê tê dîtin. Gelek kes bi taybetî ciwan ji bo lêkolîn û xwendinê serdana Navenda Çandê ya Jîna dikin.

**Şoreşa 'Jin, Jiyan, Azadî' jê re bû îlham**

Dîdar Kamil a xwediya navenda çandî diyar kir ku fikrên xebatê vedigere beriya 4 salan û got: "Bi danîna refek pirtûkan min dest pê kir. Piştre min li gel hevjînê xwe biryar da ku navendeke çandê bi navê Jîna vekin. Ji ber sala borî şoreşa jinan li Rojhilatê Kurdistanê dest pê kir û bû şoreşa jina Kurd. Me jî ji bo rêzgirtina şoreşa jinan biryar da navê navenda xwe bikim Jîna."

**'Vekirina navendê riyek ji bo berdewamiya xebatê ye'**

Li Rojhilatê Kurdistanê bi awayek cuda nêzî Kurd û jinên Kurd dibin. Weke jineke Kurd vê yekê bandor li min kir ku çawa dibe rê nadin bi zimanê Kurdî biaxivin û li gorî çanda xwe bijîn. Min jî hewl da bi riya vê navendê vê şoreşê zindî bikim da ku bikaribin bi xebatên xwe weke Kurd azadî û mafên xwe bi dest bixim. Destpêkê navanda me zêde nedihat naskirin, rojane bi riya medyaya dijîtal min behsa kar û çalakiyên li vê derê tên kirin kir û xelk berê xwe dide navendê. Li vê navedê hemû cureyên roman, pirtûkên derûnînasî, dîrokî, ayînî, erdnîgarî, tendirustî, çandî û hunerî hene."

**'Bingeha hişyariya jinan xwendin e'**

Dîdar Kamil destnîşan kir ku divê jin hişyar bin û mafên xwe bi dest bixin û wiha got: "Ji bo hişyariya jinan bingeh heye, ew jî xwendin e. Ji bo wê jî di navendê de em girîngî didin pirtûkên ku nivîskarên wan jin in. Zêdetir ciwan ji bo xwendina pirtûkan tên vê navendê. Ez gelek kêfxweş dibim ku li hemû bajaran pirtûkxaneyek hebe, ji ber niha beşek zêde ya jinan di malê de ne û divê cihek hebe ku jin bikaribin pirtûk an jî tiştek bi sûd bixwînin û dîroka xwe bizanibin û agahiya wan ji wan çalakiyên ku li seranserê cîhanê jinan dane destpêkirin hebe. Her wiha erkên jinan ew e ku di civakê de bizane bin. Ji ber em jin carnan karên ku xizmetê ji me re neke dikin."

Dîdar Kamil wiha behsa asta jinan a pirtûkxwendinê kir: "Li gorî 10 salên borî pêşketin heye. Gelek caran kesên ku serdana me dikin em li gorî temenê wan pirtûkan pêşniyar dikin û gelek caran bi xwe hildibijêrin ka kîjan pirtûkê bixwînin. Min jî weke jinekê berê jî li pirtukxaneyê kar kiriye û min pirtûkên der barê hemû mijaran de xwendine. Bi taybetî pirtûkên dîrokî da ku der barê dîroka jinan de bibim xwedî ezmûn. Min girîngî daye romanên ku jinan nivîsandine. Ji bo dema ku jinek dixwîne îradeyek bi hêz pê re çêdibe. Niha xelk bi pey mijarên din ketine û girîngî nadin wan mijarên ku wateyek wan heye, vê jî wisa kiriye ku heta astekê xwendin piştguh bibe."



# Koma Çiyayê Kurmênc Parastina çanda resen e

Govendên Kurdî yek ji nirxên herî pîroz yên çanda Kurda ye, ev govend dîrokê di nava xwe de dihewîne û diparêze. Herêma Efrînê bi kal û pîrên xwe çanda govandên Efrînê vedibêjin. Berpirsê Koma Çiyayê Kurmênc Sadet Mihemed anî ziman ku erka wan parastina çanda Kurdî Ji qirkirinê ye.

**Esma Mistefa/ Şehba**

Parastina çandê ji windakirinê erkekî pîroze, bi taybet ji bo gelê Kurd yê ku di her kêliyê de rastî êrîşên qirkirinê tê, barê wan girantire û li gorî rastiya gelê Kurd tevgerandin pêwîste. Ji bo ragihandina çanda resen ya Kurdî ji nifşên pêşerojê re divê parastina çanda gelerî ya Kurdewariya resen ku pîr û kalên me jiyan kirine û heyanê vê rojê anîne bi giranî were parastin û rê ji windakirinê re neyê vekirin.

Çanda Govendê ya herêma Efrînê di roja îro de bi riya kal û pîrên temen mezin bi riya komên kevneşop tên parastin. Li Kurdistanê û di serdema nûjen de yekemîn car e mirovên temen mezin derdikevin ser sehna û govendên ku bi demê re hatine winda kirin, pêşkêş dikin. Zêdtirî 50 govendên Efrînî hene ku hinek ji wan bi demê re hatine windakirin, ev komên kevneşopî hewildana parastina nirxên mayî bikin.

Têkildarî çanda govendên herêma Efrînê û avakirina komên kevneşopî yên ku parastina çanda resen dikin, hevserokê Komîna Govendê ya herêma Efrînê Mihemed Da'ûd û hevseroka Koma Çiyayê Kurmênc ya Kevneçopî Sadet Mihemed ji rojnameya me re axivîn.

**Govendên Herêma Efrînê**

Mihemed Da'ûd di destpêka axaftina xwe de bal kişand ser dîroka govendên Efrînê û wiha got: "Di herêma Efrînê de di salên 1956 heyanî 1958 komên destpêkê yên



**Mihemed Daoud**

govendê hatine avakirin. Destpêkê 2 komên govendê hatin avakirin, yek li navçeya Şera Gundê Qitmê û ya din jî li navçeya Şiyê li gundê Qemîliq hatin avakirin. Heyanî salên 1970'yî bi van 2 koman li Helebê û li Efrînê hate berdewam kirin, piştire hejmara koman mezintir bû."

Mihemed da xuyakirin ku bi demê re hinek govend hatine windakirin û wiha domand: "Di nava çanda Efrînê de hatiye behskirin ku zêdetirî 50 govendên Efrînî hene, lê belê gelek ji wan hatine helandin, di roja îro de zêdetirî 25 govendî hatine tesbîtkirin û em li ser wan kar dikin. Her wiha ji bo govendên ku hatine windakirin em lêkolînên berfireh dikin."

**Li hemberî qedexeyan berxwedana çanda kurdî**

Mihemed da zanîn ku ji aliyê rêjîma Sûriyê ve komên Kurdan dihatin sekinandin, li pêşiya çanda Kurdî astengî dihatin derexistin û wiha got: "Bi avakirina partiyan re di Sûriyê de komên govendên Efrînê û Helebê gelek pêş ketin û tevlî festîvalan dibûn. Dema rêjîma Sûriyê dît ku govendên kurdî pêş dikevin û di nava û gelê kurd de belav dibe, astengî li pêşiya komên govendê yên kurdî derxist, herwiha li pêşiya tevlîbûna Komên Kurdî ji festîvalan re dibû bend, li aliyekî din jî navê van koman guhartin da ku ji nasnameya Kurdî dur bixîne. Ev siyaseta hikumeta Şamê heya niha jî tê berdewam kirin. Ji bo helandina çanda Kurdan, hikumeta Şamê çanda




Kurdî qedexe kiriye."

**Çanda me bi riya govend, mûzîk, helbes û awazan tê parastin**

Mihemed destnîşan kir ku dîroka koma Kevneşopî kevine , herwiha bi Şoreşa 19 Tîrmehê re xurtir bû û li Şehab yê jî xwe careke din kom kir û wiha domand: "Koma Kevneşopî jêdara xwe ji ew kesên ku di destpêka avakirina komên guvendê ku hatine avakirin digire, hin kes ji wan jî çûn ser dilovaniya xwedê. Bi avakirina Şoreşa Rojava re derfetên me zêde bûn û hîn zêdetir ev xebat hat pêşxistin. Piştî derbasbûna me ji herêma Şehbayê re kal û pîrên komên Kevneşopî yên ku mîrasê çanda Efrînê diparêzin careke din xwe kom kirin û dest bi pêvajoyeke nû ya zindîkirina çanda mûzîk û govenda Efrînî kirin. Hêjayî bîrxistinê ye ku 2 komên Kevneşopî hene yek li Şehbayê û yek li Helebê".

**Erka me parastin û pêşxistina çanda kurdî ye**

Hevserokê Koma Kevneşopî ya Çiyayê Kurmênc Sadet Mihemed ya ku bi temenê xwe yê 58 salî parastina çanda Kurdî dike wiha axivî: "Ji salên 90' î ve min cihê xwe di nava çand û hunerê de girtiye. Ji hezkirina min ya zêde, min tavahî zarokên xwe tevlî çandê kirin. Di wan deman de, ji ber



**Sadet Mihemed**

Rêjîma Sûriyê karên çandî li Efrînê bi awayekî veşartî dihat birêvebirin, me biroveyên xwe bi awayekî veşartî didîtin. Ji bo ku em perewerdeyên gevendê bibînin, her carê em diçûn li gel malbatekê, her wiha di Şoreşa Rojavayê Kurdistanê de jî me cih girt û karê min berfirehtir bû. Di nava koma Çiyayên Kurmênc de 7 jin û 7 mêr yên temen mezin cih digirin. Bi hezkirineke mezin em karê xwe didin meşandin û ev ji bo me weke erkekî ye ku divê em dev jê bernedin".

**Çanda me paşeroj û pêşeroja me ye**

Sadet Mihemed anî ziman ku armanca koma kevneşopî parastina çanda govendên gelerî yên Efrînê ye û wiha domand: "Avakirina van Koman di şert û mercên koçberiyê de ne ji rêzê ye, helbet em bi armancên mezin nêz xebatên xwe dibin. Çawa ku bav û dayîkên me ev çand parastin û heyanî roja îro anîn, em jî berdewamiya zindîhêştina wê yekê dikin. Û em vê yekê derbasî nifşên nû yên pêşerojê bikin".

# Teyisînên xwendinê


**Di xwendina berhemên wêjeyî de, mebesta "wergirtina agahiyeke nû" ne li dar e û "armanca temamkirina kêmaniyan" jî, qet ne li pêş e. Em dikarin bêjin; xwendina berhemên wêjeyî tiştekî dîtir e.**

Xwendin, digel awayên xwe yên cur be cur, di dema xwendinê de kartêkên rengorengo dike û piştî xwendin bi dawî dibe; kartêkên ketî behsê diçin digihîjin dongiyên cihêreng.

Her wiha, gava em serê pêşîn, di ser agahiyê re (zanîna ku di kêliya xwendinê de digihîje xwîner) bala xwe bidin xwendinê, em ê karibin bêjin, havêna ku jê tê hildan, zêdetir di ser fêrbûnê re ye.

ger xwîner ji bo wergirtina agahiyeke (information) nû dixwîne, hingê çêja ji xwendinê tê girtin, di ser "temambûna kêmaniyê" re ye ku mirov dikare wê di rengê "fêrbûn"ê de derbibire û bêje; hest û pêhisîna xwîner ya di vê çalakiyê de, bi giştî di ser asta "agahiya hildayî" re ye.

ger xwîner di çalakiya xwendina xwe de, hay jê hebe ku ji bo "temamkirina kêmaniyên xwe" dixwîne, hin-



geha çêja ji xwendinê tê girtin digel "fêrbûna zanînê" di rengê xurtkirin û pihêtkirinê de ye.

Di xwendina berhemên wêjeyî de, mebesta "wergirtina agahiyeke nû" ne li dar e û "armanca temamkirina kêmaniyan" jî, qet ne li pêş e. Nexwe, em dikarin bêjin; xwendina berhemên wêjeyî tiştekî dîtir e û di xwe de taybet e.

Di feraseta klasîk de, xwendina berhemên wêjeyî; li ser "pêrayîkirin (like) û pesendkirinê (appreciate)" ye.* Ev feraseta xwendinê ya klasîk, bêtir ji bo helbestan rûniştiye û estetîkeke pesendkirinê jê peyde bûye ku "Xweş(ikah)î ne di helbestê de lê di pêhisîn an jî di pesendkirina xwîner de peyde dibe."

Di serdema modern de, estetîka pêrayîkirinê û şêweyê xwendinê guheriye û xwendin, nirxandin û hikmlêdana ji bo berhemên wêjeyî, pey der pey ji estetîk û pesendkirina berê dûr ketiye; rengekî dîtir daye xwe û berhem piştî xwendinên xwîneran bi awayekî dîtir hatine nirxandin û dahûrandin; û êdî peyvên wekî "xweş, bedew", ji bo berheman nehatine bikaranîn. Di serdema modern de, êdî armanca xwendina berhemê ne çêjêhildan e; lê armanca xwendinê êdî qefaltin, têgihîştin, şirovekirin û dahûrandina "rastî û heqîqeta berhemê" ye. Loma jî, divê bila honakî be, an jî bêjarî (discoursive-rethorical) be, her wekî Roland Barthes destnîşankirî, di xwendina berheman de, "Geriyan bo heqîqeteke yekane û hevpar tê kirin; ji ber ku ew bi xwe êdî rastiya peyvê ye."

Herçî xwendina berhemên wêjeyî yên kurmancî ne; beşek zêde ji nirxandin û hikmdanan, hê jî li ser estetîka serdema klasîk e. Ji bilî analîzên objektîf ên nivîskî ên kêmhejmar ku bi nêrîneke objektîf angaştên xwe dispêrin gelek cure û awayên ramanan jî, piraniya hikmdan û nirxandin li ser peyva "xweş"ê ne û "Pesendkirina ku ji bo qedexekirina peyvê heye" gelek rêyan li berhemê jî digire. Ji ber hindê, berhem, ji armanca lêgerîn û qefaltina "rastî û heqîqeta hundirî" ya berhemê dûr tên xwendin û berhema hatî xwendin, dide dû subjektîfiya rengdêra "xweş."

Her wiha, ger em bala xwe bibin sedem û jêderka xwendinê, em ê karibin pişta xwe bidin Barthes û bêjin, şiroveya xwîneran a li ser berhemên xwendî, pasticheyî û hewespêanînî ye. Yanî, xwîner, hem di dema xwendinê de hem jî piştî bidawîkirina xwendinê, bi awayekî ji awayan, şiroveyek li ser berhemê dike; û gava ew şirove, bi gotinên "xweş e, kêf da min, min kêf jê girt" bide der û ev gotin rengûawayê (quality) berhemê destnîşan bikin, em ê karibin bêjin; hingê xwîner di heman demê de behsa xwe jî dike ku ev reng şirove li ser 'xwe-psîkolojî (self-psychology)'yê ava bûye; û di ser "pêxweşbûn û pesendkirina xwîner" re, payeyeke qebûlbar dide berhemê û xîçek jî keys, şiyan û heqê 'serketîbûn û behreya afirînê' nade nivîskar û em ji gotina "pirtûkeke-romaneke-çîrokeke-helbestekê xweş" ya xwîner û nirxandinan wisa fam dikin ku divê kar û xem û têxebitîna nivîskar tenê ji bo kêfxweşkirina xwîner be.

Ger em pirsekê bikin û bêjin; "nexwe çi ye ya ku berhemê ji pêrayîkirin û pesendkirina xwîner azad dike?" Bersiv ev e; pêwîst e xwîner di dema xwendinê de xwe ji hîsa xweşîjêgirtinê dûr bixe da ku rê û derfeteke dîtir ya objektîfbûnê çêbibe li ber xwîner û berhemê. Gava ev rê û derfet çêbû; wê dûringeke taybet di navbera xwîner û berhemê de çêbibe ku navê wê "dûringa rexnekirinê" ye û wê ev dûring bibe sedem ku berhem, bi rastî û heqîqeta xwe ya hundirî nêziktirî xwîner bibe û bi vî awayî hikmê xwîner yê li ser berhemê kêmtir bibe û peyva "xweş" êdî nikaribe di ser pesendkirina subjektîf re bendan li ber berhemê dayne û wê li ser pîver û krîterên wêjeyê, ji bo dîyarkirina rengûawayê berheman, peyvên wekî "xurt-qels, serketî-neserketî" bên bikaranîn û jê û pê ve, wê berhem û xwîner ji hev bêminet bin.

# Navenda Diyalîzê ji nexweşiya gurçikan re cihê çareseriyê ye

**Xebatên tendurstî yên Navenda Şuştina Gurçikan ( Diyalîz) xwesteka gelê herêma Cizîrê bi vîneke xurt kar û xebatê ji bo başkirina rewşa nexweşan dikin.**

**Hemza Sêvo/ Qamişlo**

Navenda Şuştina Gurçikan ya li bajarê Qamişlo; yek ji navendên ji bo xizmetguzariya tendurstî ya gelê herêma Cizîrê ye. Ev navend di yekê cotmeha 2021`ê de hat vekirin. Herwiha ev navend girêdayî Desteya Tendurstiya Herêma Cizîrê ye.

Hejmara xebatkarên tendurstiyê yên vê navendê 17 xebatkar, rêveber û bispor in. Yek ji wan rêveberê navendê ye, 2 rêveberên tendurstî ne, 8 ji wan berdestên bijîşkan in û hejmara bisporên taqîkirin, dermanan û benckirinê jî 6 in.

Navenda Şuştina Gurçikan ji bilî roja înê, rojane ji demjimêr 8 heya demjmêr 22`yan di kar û xebatê de ye. Herwiha 8 alavên teknîkî yên taybet ji bo şuştina gurçkan (Diyalîz) hene.

Diyalîz jî, ew pirosesa rêbazeke tendurstî ye, bijîşk vê prosesê ji nexweşên ku gurçikên wan nema bi awayekî durst, bi erkê xwe radibin, tê çêkirin. Herwiha armanc ji çêkirina vê pirosesê paqijkirina gurçikê ji mekrobatan e. Alava Diyalîzê xwîna mirov dikşîne filtera safîkirinê, ji mikrobatan paqij dike û dîsa vedgerîne laşê mirov da ku xwîna wî careke din were ser gurçikên wî. Hêjayî gotinê ye ku bi saya vê pirosesê jiyana wî bi awayekî baş berdewam dike. Welatiyên tevahiya herêma Cezîrê, bi hêviya destxistina çareseriyê û ji bo gurçkên xwe bişûn, meqseda Navenda Şuştina Gurçkan a bajarê Qamişlo dikin. Herwiha ev navend pêşwaziya wan dike û hewl dide ku hêviya wan bi cih bîne. Navend, heftane du pirosesên Diyalîzê ji her nexweşekî/ê re çêdike û di mehê de nêzî 600 pirosesên Diyalîzê ji nexweşan re çêdike.

Girêdayê mijara kar û xebata Navenda Şuştina Gurçikan ya ji bo welatiyên nexweş yên herêma




Cezîrê, xebatkatrên navendê û nexweşên di navendê de ji Rojnameya Ronahî re axivîn.

**'Pêwîstiya herêmê bi navendeke wiha hebû'**

Rêveberê Navenda Şuştina Gurçikan Rafi` Ebas diyar kir ku armanc ji vekirina Navenda Şuştina Gurçikan, pêwîstiya gel bi vekirina navendeke wisa bû û



**Rafi` Ebas**

wiha got: "Şîniyên herma Cizîrê dema derbasî nexweşxaneya Wetenî ya bajarê Qamişlo, gelekî astengî derdiketin pêşiya wan. Ev nexweşxane di bin siya Rêjîma Sûriyê de ye, û nexweş gelekî paşguh dikirin. Herwiha gelek ji nexweşan ji ber sedema derfetên madî yên kêm jî nikarîbûn biçin nexweşxaneyên herêmên din, lewra astengdar dibûn û gelek ji wan jî mixabin jiyana xwe ji dest didan. Me ji ber pêwîstiya gelê xwe ya ku bû bersiv ji rewşa wan ya xirab re, ev navend vekir. Em weke xebatkarên vê navendê çi erka ku dikeve ser milê me ji bo rêvebirina karê navendê û alîkariya gel, pêk tînin. Di heman demê de dermanên pêwîst ji bo nexweşan tên dayîn û pirosesên



**Lorans Ebdullezîz**

Diyalîzê jî tên çêkirin, herwiha dayîna dermanan û çêkirina van pirosesan tev jî bê pere ne û navend hemû mesrefên madî hildigire ser milê xwe."

**'Astengî bandorê li kar û xebatê dike'**

Bijîşkê Gurçikan û rêveberê tendurstî yê Navenda Diyalîzê Lorans Ebdullezîz diyar kir ku kêmanî û astengiyên ku navenda me dikêşe bandorê li pirosesa Diyalîzê dike û wiha axivî: "Em weke bijîşkên nexweşiyên gurçikan, di vê navendê de rewşa nexweşên xwe bi awayekî baş dişopînin û li ser pirosesa Diyalîzî disekinin. Lê hin astengî derdikevin pêşberî kar û xebatên me û bandore li rewşa tendurstî ya nexweşên me dike. Herwiha pirsgirêka ku em tê dikêşin; biçûkbûna avahiya navenda me ye. Navenda Şuştina Gurçikan li gor hejmara welatiyên herêma Cizîrê gelek, biçûk e û divê navendeke ji wisa mezintir ji bo nexweşan were vekirin. Di heman demê de jî nexeş carnan dermanan ji derve dikirin, ji ber ku ev derman li navendê peyda nabin. Wekî din jî pêwîstiya me bi hejmareke din ji alavên ji bo çêkirina pirosesa Diyalîzê heye. Herwiha pêkanîna vê yekê wê tu astengiyê ji nexweşên me re dernexe û wê nehêle ku nexweş herin herêmên derve û astengiyên curbecur derkevin pêşiya wan. Niha jî ji bo ev astengî werin çareserkirin, em banga xwe dighînin Rêveberiya Xweser û Rêxistinên Tendurstiyê yên Navnetewî. "



**Ehmed Hecî Ebdo**

**Rewşa tendurstiya nexweşan**

Welatiyê nexweş yê bi navê Ehmed Hecî Ebdo ku ji navçeya Amûdê ye, da zanîn ku rewşa wî ya tendurstî bi saya navenda Şuştina Gurçikan ji berê baştir bû û wisa domand:" Ji dema ku ev navend hateye vekirin, ji bo ku pirosesa Diyalîzê ji min re were çêkirin, ez heftiyê du caran têm navendê. Ez nikarim gurçikên xwe biguherînim, ji ber vê yekê jî neçar dimînim ku van pirosesan çêbikim. Beriya niha min gelekî zor û zehmetî ji ber gurçikên xwe dikişand, lê niha bi saya van pirosesên ku Navenda Diyalîzê ji min re çêdike rewşa min a tendurstî baş e. Ev navend bi tevaya xebatkarên xwe yên tendurstiyê rewşa me dişopînin, di heman demê de wergirtina derman, çêkirina Diyalîzê, taqîkirina xwînê û hwd… bê pere ne, ku weke alîkariyê ye û ev navend ji me re pêşkêş dike."

# Xweza ji bo rantê tê talankirin

Bendav, gol û HES ên li Wan û navçeyên wê ji bo rantê hatine çêkirin, bûne sedema talankirina xwezayê.

Çemê herî mezin ê bi ser Gola Wanê ve diherike, Çemê Bendîmahî ye. Santralên Hîdroelektrîk (HES), bendav û golên li ser vî çemî hatine çêkirin, bûne sedem ku çem ziwa bibe û bi sed hezaran masiyên gola Wanê bimirin.

Gola Wanê gola herî mezin a cîhanê ya ji ava bi soda ye. Gelek çemên biçûk û mezin bi ser Gola Wanê ve diherikin. Li navçeya Erdîşê çemên Zîlan û Delîçay, li navçeya Bêgirê jî çemê Bendîmahî bi ser golê ve diherikin. Çemê herî mezin ê bi ser Gola Wanê ve diherike çemê Bendîmahî ye. Bendîmahî yek ji çemên sereke ne ku masiyên gola Wanê ji bo hêkan lê bikin, koçî wê dikin.


**Bi hezaran zindî hatin qetilkirin**

Çemê Bendîmahî ku havînê zêde diherike û li hin deveran bi 2 metreyan kûr e, ji ber HES, bendav û golên ji bo rantê hatine çêkirin, li ber ziwabûnê ye. Ji ber vê yekê jî di serî de masiyên gola Wanê û hêkên wan, bi hezaran zindiyên li qadê mirin.

Sûlava Bêgirê ku bi bedewiya xwe ya xwezayî tê naskirin, ji ber HES'ê vê taybetmendiya xwe ji dest dide. Li derdora Sûlava Bêgirê ku bi 8 kîlometreyî dûrî navçeyê ye û li ser Çemê Bendîmahî ye, ji ber HES'an ava wê kêm bûye. Kêmbûna avê jî bandoreke neyînî li ser tûrîzmê dike ku yek ji çavkaniyên debara xelkê herêmê ye.

**Dsî pêşî li avê digire**

Tevî ku ava Çemê Bendîmahî kêm bûye û gelî ziwa bûye, Karên Avê yên Dewletê (DSÎ) ji bo zindî nifşên xwe dewam bikin divê hinek avê berde. DSÎ ji ber ku ava li HES û bendavê difiroşe, avek bi têra zindiyan bike bernade.





# Kalkan:Ti qanûn nikarin pergala Îmraliyê bidomîne

**Navenda nûçeyan**

**Endamê Komîteya Rêveber a PKK'ê Dûran Kalkan diyar kir ku desthilatdarên Tirk her gava ku tengav dibin zilmê li Îmraliyê, gerîla, Rojava û siyaseta demokratîk dikin û got, "Gelekî ditirsin, lê bi kêr nayê. Wê hilweşin."**



Kalkan diyar kir ku ger çend kesên çep, sosyalîst, rewşenbîr, demokrat û hunermend mîna rojnamevan Merdan Yanardag helwestê nîşan bidin, wê pergala rejîma Îmraliyê têk biçe.

Kalkan got, "Ji tirsa xwe ew girtin. Eger yek-du kesên din jî wiha biaxivin, wê pergala Îmraliyê hilweşînin. Nikarin wiha bidomînin. Ji ber ku bêtir jê ditirsiyan, hewil dan Merdan Yanardag bi lez bêdeng bikin. Ev tê wateya ku ew gelek qels in. Ger bi hêz bûna wê vê yekê nekirana. Ji ber ku qels in zextê li Rêber Apo dikin. Her cara ku dixitimin an jî têk diçin, dixwazin bi zextê temenê xwe dirêj bikin, lê bê feyde; ew ê têk biçin!"

Kalkan her wiha destnîşan kir ku, ji bo şikandina tecrîdê û hilweşandina faşîzm û pergala qirker divê têkoşîn hîn bêhtir bi plan û rêxistinkirî were meşandin.

**100 sal in kurd li dijî pêvajoya qirkirinê ya bi lozanê hatî destpêkirin, li ber xwe didin**

Her kes Peymana Lozanê dizane. Peymanek e ku herî qala wê hatiye kirin û hatiye nîqaşkirin. 24'ê Tîrmeha 1923'an hatiye îmzekirin. Pêşiya damezrandina Komara Tirkiyeyê vekiriye. Înkar û îmhaya Kurdan aniye rewşa qanûnî, peymanek e ku qirkirina Kurdan dayî destpêkirin. Weke encamên Şerê Cîhanê yê Yekemîn derket holê. Îngilistan û Fransayê pêşengî kirin. Bi tevgera Kemalîst re li hev kirin. Di rastiyê de ya beriya wê hebû; Sewr hebû, Mutarekesa Mondrosê hebû. Tevgera Kemalîst ew bê bandor kirin. Zorî li Îngilistan û Fransayê kir ku li Lozanê peymaneke nû were îmzekirin. Wê demê bi çi kir, bi piştevaniya kî/ê wisan kir?

Di fermandariya Kazim Karabekir de artêşeke Osmanî mabû, hinekî tiştên demokratîk di yên li Egeyê de hebûn. Mîna Çerkes Ethem… Lê hêza dînamîk a esas, hêza Kurd a li dijî dagirkeriyê bû, gelê Kurd bû, bi piştevaniya gelê Kurd çêbû. Heta ku Lozan îmze kirin heta asta dawî wisan tevgeriyan mîna ku her kesê digirin nava xwe û dikin yek. Lê piştî Lozan îmze kirin, pêvajoya dewletê ya neteweyî ya yek şexsî destpê kir. Dewleta bi zihniyet û siyaseteke wiha hat avakirin.

Piştî vê jî hêzên ku di rastiyê de Enetolî ji dagirkeriyê rizgar kirin û rizgarî pêk anîn, yek bi yek hatin tasfiyekirin û îmhakirin. Kazim Karabekir jî wisa bû. Ethemên Çerkesî jî wisa bûn. Ji xwe qet nehiştin Mûstafa Suphîler bikeve welat. Herî zêde jî êrîşî gelê Kurd kir. Dîsa Mîsaqê Millî hat berovajîkirin. Amasya Tamîmî ji holê hat rakirin. Qanûna Sereke ya 1921'an, ji Kurdan re mûxtarî hat jibîrkirin. Daxuyaniyên Mûstafa Kemal ên têkildarî vê yekê, hatin jibîrkirin. Piştî wê li ser piştevaniya navneteteweyî pêvajoyeke nû ya qirkirinê destpê kir. Ev li Bakur qewimî, li Rojava, Başûr û Rojhilat qewimî. Sed sal in Kurd di bin êrîşeke bi vî rengî de ne. 100 sal in li dijî êrîşa faşîst, mêtinger û qirker li ber xwe didin. Bi wêrekî û qehremanî li ber xwe didin. Bi sed hezaran, belkû bi milyonan şehîd dane. Nîviya vê berxwedanê li parçeyên cuda, di berxwedanên di bin rêbertiyên cuda de qewimîn; niviya wê ya duyemîn jî bi pêşengiya Rêber Apo û PKK'ê çêdibe. PKK û Rêber Apo mohra xwe li 50 salên dawî dixin, berxwedana ku bi pêşengiya Rêber Apo pêş ketî mohra xwe lê dixe.

Lozanek çawa derxistin holê? Kurd kirin mijara bazirganiyê û wisan derxistin. Yanî qala meseleyên Kerkûk û Mûsilê hate kirin. Di navbera xwe de ji bo berjwendiyên xwe li ser Kurdan bazirganî kirin û li hev kirin ku Kurdan bigirin nava sîstema înkar û îmhayê. Nirxên Kurdistanê parçe kirin û ev tişt kirin. Ev gelek eşkere ye.

**Erdogan dixwaze qirkirina kurdan bi hemû nato'yê bide qebûlkirin**

Em dikevin salvegera 100'emîn a vê peymanê. Rêveberiya Tayyîp Erdogan û Tifaqa Komarê, sedsala duyemîn îlan ki, "Sedsala Tirkiyeyê" îlan kir. Dixwazin heman zihniyet û siyasetê bimeşînin. Yanî dixwazin heman sîstemê bidomînin û Lozanê nû bikin. Di rastiyê de li bin bazariya ketina Swêdê ya NATO'yê ev heye. Tê xwestin ku vê rewşê bi NATO'yê bidin qebûlkirin. Di pêvajoya Lozanê de beriya 100 salan mijara bazariyê Mûsil û Kerkûk bû, niha rewşa endamtiya Swêdê ya li NATO'yê… Rêveberiya Erdogan ev yek weke kozekî kiriye destê xwe de. Dixwaze bi hemû NATO'yê vê bide qebûlkirin: Em ê Lozanê nû bikin, her kes wê qirkirina Kurdan qebûl bike, di bin navê terorîzmê de êrîşên tunekirina Kurdan ez ê pêk bînim, NATO wê piştgiriyê bide min, di aliyê siyasî û leşkerî de piştgiriyê bide, ti kes wê li hemberî dernekeve, her kes wê vê yekê qebûl bike. Her kes wê were xeta Lozanê. Yanî wê bibe hêza piştevaniya qirkirina Kurdan. Wê bibe hevkarê her tiştê ku dewleta Tirk bi serê Kurdan bîne. Tişta tê ferzkirin, ev e! Di rastiyê de bazariya hatî kirin, ev e. Nizanim li wir qanûnên antîdemokratîk hene, hin Kurd hene; wê paş de bên şandin, nayên şandin, qala wê vê tê kirin. Ewane vale ne! Rastiyê wê ev e. Li ser vî bingehî muzakere û bazirganiyeke zêde heye. Rêveberiya Tayyîp Erdogan bi zorîkirina vê hewl dide bi Swêdê û NATO'yê jî vê bide qebûlkirin. Tişta tê kirin, ev e.


**Berxwedana girtîgehê ya mezin a sala 1982'an dema duyem a PKK'ê da destpêkirin**

Sed sal in Kurd li dijî Lozanê li ber xwe didin. Bi pêşengiya Şêx Seîd li Amed, Elezîz, Bîngol û Bedlîsê li ber xwe dan. Piştre li Serhedê li ber xwe dan, piştre li Dêrsimê li ber xwe dan, li Rojhilat li ber xwe dan, li Başûr li ber xwe dan. Di nava pêncî salên dawî de PKK'ê ev berxwedan dewr girt. Rêber Apo berxwedaneke nû ya azadiyê temam kir, rêxistin kir. Ji berxwedanên berê ders derxist, hewl dan lewaziyên wan derbas bike. Li ser vî bingehî anî wê rewşê ku berxwedan 50 salan bêyî navber dewam bike. Wisan lê kir ku kes nekariyê. Ev gelekî girîng e. 50 salên xwe derbas kirin, berxwedanek wiha di sala 51'emîn de ye. Ev gelekî girîng e. Di dîroka Kurdistanê de cara destpêkê wisa çêdibe.

Demên girîng a berxwedana PKK'ê hene. Ya destpêkê derketin û partîbûna Rêbertî. Vê demê bingehê zihniyeta vê berxwedanê derxist holê. Têkoşîna li dijî zihniyet û siyaseta qirkirina mêtinger a li dijî Kurdan, derxist holê. Têkoşînên berê çima bi ser neketin; ew nirxand û berxwedaneke nû amade kir.

# Berxwedana 14'ê Tîrmehê

**Siyasetmedar-nivîskarê Kurd Fûat Kav qala Rojiya Mirinê ya Mezin a 14'ê Tîrmehê kir û destnîşan kir ku şehîdên şoreşger bi wêrekî, exlaq û berxwedana xwe di çalakiyeke efsanewî de gihîştin hev.**



Fûat Kav bi bîr xist ku kadroyên pêşeng ên tevgera PKK'ê ku wê li Rojhilata Navîn di asta gelekî girîng de bi rolê rabûna, li zindana Amedê dîlgirtî bûn û got, "Piştî ku dîl hatin girtin, siyaseta îtirafkirinê, teslîmwergirtinê û şikandina îradeya wan dihate meşandin. Eger ev siyaset bi ser ketibûya, têkbirina PKK'ê li Girtîgeha Amedê wê derbeke mezin li şoreşa Kurdistanê, li şoreşa Rojhilata Navîn bihata xistin. Lewma hem Girtîgeha Amedê xwedî roleke gelekî girîng bû, ji aliyê şoreşê û dijberiya şoreşê, hem jî pêşketin û mezinbûna tevgera PKK'ê xwedî rol û mîsyoneke girîng bû. Dema ku ji



vî alî ve bê nirxandin, îradeya li wê derê bihata nîşandan an jî şikestina îradeyê wê bandorek li şoreşê yan jî dij bi şoreşê bikira. Lewma berxwedana li wê derê hate nîşandan hem berxwedana Şoreşa Kurdistanê bû, hem jî dihat wateya berxwedaneke şoreşê ya dema pêş a li Rojhilata Navîn. Ji ber vê yekê Rojiya Mirinê ya Mezin a 14'ê Tîrmehê xwedî rol û mîsyoneke girîng bû."

Fûat Kav bi bîr xist ku beriya Rojiya Mirinê ya Mezin a 14'ê Tîrmehê çalakiyên gelekî mezin hatibûn kirin û got, "Çalakiya hevalê Mazlûm Dogan, çalakiya wî ya di asta fedaî de, piştre jî çalakiya Çaran a şewitandina bedena xwe hem bandoreke mezin li dijmin kiribû, hem jî nîşan dabû ku PKK'ê tê çi wateyê, kadroyên PKK'ê têne çi wateyê, xwedî sekn û îradeyeke çawa ne. Her wiha ji aliyê bandora li ser girtiyan jî xwedî roleke girîng bû. Lê belê herdu çalakî, yanî çalakiya Mazlûm Dogan û çalakiya Çaran ji aliyê bidawîkirina kiryarên li Girtîgeha Amedê têrker nebû bû. Bandoreke girîng kiribû. Pirsên girîng xistibû mejiyê dijmin. Helwest, berxwedêriya PKK'ê û kadroyên wê nîşan dabû. Lê belê di têkoşîna dijî teslîmiyet û xiyanetê de ji aliyê encamwergirtinê ve têrker nebû bû. Ji ber vê jî pêwîstî bi çalakiyên nû hebû, bi helwestên nû, bi sekneke serbilind a cuda ya li dijî rejîma 12'ê Îlonê hebû. Rojiya Mirinê ya Mezin a 14'ê Tîrmehê bi vî rengî bû."

Siyasetmedar Fûat Kav anî ziman ku çalakiya Rojiya Mirinê ya Mezin a 14'ê Tîrmehê çalakiyeke derengmayî bû û bi bîr xist ku çalakî wê berê bihata destpêkirin, lê belê ji ber ku heyeta dadgehê mafê axaftinê nedida pêşengê çalakiyê Mehmet Hayrî Dûrmûş, dikir nedikirin nikarîbûn çalakiyê bidin destpêkirin.

Fûat Kav got, "Lê belê di 14'ê Tîrmeha 1982'an de heyeta dadgehê careke din mafê axaftinê neda hevalê Hayrî Dûrmûş. Hevalê Hayrî jî bi israr mafê axaftinê xwest û diyar kir ku wê daxuyaniyên gelekî girîng bide, ev daxuyanî wê rêveçûna dadgehê diyar bike, wê rêveçûna girtîgehê diyar bike, wê rêveçûna tevgerê diyar bike. Li ser vê bingehê heyeta dadgehê neçar ma ku mafê axaftinê bide hevalê Hayrî Dûrmûş. Piştre jî hevalê Hayrî Dûrmûş daxuyanî da, qala armanca polîtîkaya êşkenceyê ya li girtîgehê, wateya rejîma 12'ê Îlonê, rola PKK'ê kir û anî ziman ku di şert û mercên heyî de li pêşiya pêkanîna parastina siyasî astengiyên gelekî cidî hene. Her wiha bal kişand ser zexta îtirafkariyê, hewldanên reşkirina PKK'ê û destnîşan kir ku li dijî van kiryaran û pê ve ew ji îro û pê ve dest bi rojiya mirinê dike."

Fûat Kav anî ziman ku piştre Kemal Pîr û hevalekî din li dadgehê tevlî çalakiya Hayrî Dûrmûş bûn û got,"Beşdarî rojiya mirinê bûn. Piştre heval hatin girtîgehê. Ez wê demê li dadgehê nebûm. Tevî hevalê Akîf Yilmaz em bi hev re li heman hucreyê bûn. Piştî ku agahî gihîşt me, di encama nîqaşa bi heval re em jî tevlî bûn.

Yanî piştî du rojan hevalê Akîf jî tevlî rojiya mirinê bû. Bi vî rengî hevalê Hayrî Dûrmûş piştî ku xistin hucreya li girtîgehê wiha gotibû: Me bi ser xist, me bi ser xist. Me bi şeş kesan bi ser xist.

Yanî li dadgehê wê demê şeş kesan dest bi rojiya mirinê kiribûn. Piştî du rojan jî li girtîgehê du heval tevlî bûn û hejmara çalakgeran bû heyşt kes. Bêguman piştre tevlîbûn çêbû, mezin bû. Bi vî rengî Rojiya Mirinê ya Mezin a 14'ê Tîrmehê destpê kir."

# Malbatên şehîdan piştgirî didin dadgehkirina çeteyên DAIŞ`ê

Malbatên şehîdan li bajarê Qamilo piştgirî didin biryara Rêveberiya Xweser a dadgehkirina çeteyên DAIŞ`ê û bang li civaka navdewletî dikin ku bi erkên xwe yên exlaqî rabe.

**Birûc Resûl/Qamişlo**

Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê di 10'ê Hezîranê de, biryar da ku çeteyên DAIŞ'ê yên ku di destê wê de girtî ne werin darizandin. Rêveberiya Xweser gelek caran daxwaz ji civaka navdewletî kiriye, ku erkên xwe ji bo dîtina çareyan ji dosyeya endamên DAIŞ`ê yên girtî re bi cih bîne.

Di vê çarçoveyê de, malbatên şehîdan daxwazên xwe ji bo bilezkirina dadgehkirina çeteyên DAIŞ`ê ku bûne sedema wêrankirina Sûriyê û kiryarên terorîstî yên hovane li dijî sivîlan kirine. Fatima Hesen Elcasim dayika şehîd Fêsel Elcerbû`i di sala 2016`an de, li navçeya Şedadê ya girêdayê bajarê Hesekê hat şehîd xistin û hevjîna şehîd De`ar Elcerbû`i di sala 2017`an de, li gundê Tilbirak a girêdayê bajarê Qamişlo hat şehîd xistin, axivî û got:" Em ji destpêkê ve li benda vê biryarê bûn û çavê me li civaka navdewletî bû, ku vî karî bi cih bînin. Lê weke her car civaka navdewletî li beramberî vê yekê erkê xwe pêkneanî. Lê çawe ku gelên bakur û rojhilatê sûriyê bi Rêveberiya xwe ya xweser li dijî çeteyên DAIŞ'ê şer kirin. Îro jî gelê bakurd û rojhilatê sûriyê bi biryare ku çeteyên DAIŞ'ê dadgehbike.



**Fatima Hesen Elcasim**

### Tirkiyê naxwaze DAIŞ' were dadgehkirin

Fatima Elcasim berdewamî da axaftina xwe û got: "Em piştgiriya biryara Rêveberiya Xweser dikin û em bang li civaka navdewletî dikin ku piştgirî bidin vê pêngavê. Bi ragihandina Rêveberiya Xweser a biryara darizandina çeteyên DAIŞ'ê re, dewleta Tirk a dagirker êrîşên xwe yên li ser herêmê zêdetirkirin. Sedemê van êrîşan jî ew e, ku dagirkerên tirk naxwazin ku çeteyên DAIŞ'ê werin darizandin û bi vê darizandinê re naxwaze ku rastiya peywendiyên wan û çeteyên DAIŞ'ê ji raya giştî re hîn zêde işkere bibe. Fatima Hesen Elcasim di dawiya axaftina xwe de wiha got:" Em malbatên şehîdan, piştgiriya Rêveberiya xweser heya dawiyê dikin. Herwiha ji mafê malbatên şehîdan e ku cihê xwe di nava darizandina çeteyên DAIŞ`ê de bigre. Fatima da zanîn ku rêveberiya Xweser a ji bo pêkanîna edaletê bi darizandina çeteyên DAIŞ'ê yên ji aliyê wê ve hatine girtin, bilind nirxand û bang li civaka navneteweyî kirin ku destekê bidin û beşdarî vê dadgehê bibin."

Eyda Xelîl dayika şehîd Orha Qamişlo ku di şerê navçeya Til Hemîs a girêdayê bajarê Qamşlo de hat şehîd xistin, diyar kir ku gelek caran daxwaz ji civaka navdewletî û aliyên din hatiye kirin ku pêwîstiya çareserkirina vê pirsgirêkê bi avakirina dadgeheke navdewletî, rêveberiya xweser biryara xwe ya destpêkirina darizandina çeteyên DAIŞ`ê di 10`ê Hezîranê de ragihand û li ser vê bingehê amadekariyên pêkanîna vê biryarê di demeke nêz de tên kirin.

### Divê civaka navneteweyî beşdarî dadgehan bibe

Ayda bal kişand ser wê yekê ku divê ev dadgeh bi giştî be û bi weşaneke zindî ji medyayê re bên nîşandan, da ku hemû cîhan şahidiya edaletê bike û got:" Biryare dadgehkirina çeteyên DAIŞ`ê biryarekî herî rast û edalete. Lê bile her dewlete xwe berpirsiyar bibîne û beşdarî vê dadgihê bibe, herwiha heya niha tu dewlet xwe berpirsiyar ne dîtiya. Ev yek jî tê wateya ne qebûlkirina wan ji dadgehkirina çeteyên DAIŞ`ê re. Li gorî ku tê xuyakirin ku desteka gelek dewletan ji çeteyên DAIŞ`ê re heye."

Ayda di berdewamiya axaftina xwe de diyar kir ku ev pêngava yekemîn e, ji bo pêkanîna edaletê ji bo malbatên şehîdan ên ku bi destê çeteyan şehîd bûne. Her wiha bang li kesên ku di



**Ayda Xelîl**

dadgehkirina çeteyên DAIŞ'ê yên girtî de cih digirin kir ku cezayên herî giran li dijî hemû kesên ku destên wan di xwîna zarokên wan de heye û daxwaz kir ku ev dadgeh bên eşkerekirin da ku her kes dadmendiyê bibîne. Derengketina civaka navdewletî û nexwestina welatan ji girtina welatiyên xwe yên girtî di girtîgehên Hêzên Sûriyeya Demokratîk de, tirsek mezin heya bi taybet ji aliyê dewleta Tirk ve. Ji ber ku dadgehkirina çetyên DAIŞ`ê, eşkerekirina hevkariya dewleta tirk bi çeteyên DAIŞ'ê re ji her kesî re işkere dibe.

Ayda Xelîl axavtina xwe wiha bi dawî kir û got:" banga me ji bo rêveberiya xweser heye, ku hemû çeteyên ku destê wan ketî nava xwîna gelan li bakur û rojhilatê sûriyê wrin dadgehkirin. Dadgehkirina çeteyan ji milê gel û Rêveberiya Xweser ve biryar û gaveke herî rast e. Di dawiyê de bang me ji civaka navneteweyî jî heya ku piştgiriyê bidin vê pêngavê û beşdarî dadgehkirina çeteyên DAIŞ'ê bibin.

# Rêgeza bingehîn ya welatparêziyê sekna li dijî xiyaneta mala Barzanî ye

**Volqan Elî**

'PDK'ya Barzaniyan hê di destpêka xwe de cih û helwesta xwe diyar kiriye. Biryar daye ku her tim li ser xeta xiyanetê bi israr bimeşe û ev amela xwe jî piştrast kiriye. 'KDP' ji kuştina şoreşgerên Qazî Muhammed, Dr. Şivan Saît Elçi, Silêman Maûnî, Elî Esker, Elî Şaban, Diyar Xerîb, Mam Zekî, Qasim Engîn û hê bi sed hezaran şoreşger û welatparêzên Kurd berpirsiyar e. Ev xiyaneta mezin a Mala Barzanî-'PDK'ê ne tenê bi Başûrê Kurdistanê sînordar e. Pirsgirêkek wisa ya neteweyî ye ku hemû parçeyan eleqadar dike, li ser pêşeroja gelê Kurd bandora wê heye. Di serî de Başûrê Kurdistanê hewce dike Kurd, rewşenbîr, hunermend, partî û rêxistinên siyasî yên li hemû parçeyan seknekê nîşanî vê rewşê bidin. Armanca hêzên xêrnexwaz ew e ku dixwazin bi Kurdîniyeke sexte û durî gelê Kurd ji holê rakin. Ji bo vê jî Kurdên Sipî (Mala Barzanî) wezîfedar kirine.

Gelek wezîfeyên Mala Barzanî hene. Yek ji wan jî; rewakirina qirêjiyên dewleta dagirker a Tirk ê. Bi dagirkirina Efrîn, Serêkaniyê û Girê Sipî ji aliyê dewleta Tirk ve Mala Barzanî xiyaneta xwe kûrtir kiriye. Ev jî bûye sedem ku zêdetir teşhîr bibe. Li Efrînê ji aliyê dewleta Tirk ve heta bi niha hezaran darê zeytûnê ji ra û rîçikan ve hatine rakirin. Ne tenê ew, kokê Kurdiniyê li herêmên dagir kirî diqelîne, bigir ji Filistîna dagir kirî heta ji Qatarê, li ser navên wan wargeh ava dike, miriyan ji gorê wan derdixe û diavêje ber lingan, destdirêjî li jinan dikin, li Serêkaniyê bi bombeyên fosforê zarokên Kurdan hatin şewitandin. Li Efrîn û herêmên dagir kirî yên din, cihên pîroz ên Kurdan ala dewleta Tirk hate çikandin. Lê belê Serokê Herêma Kurdistanê yê wê demê (2019) Nêçîrvan Barzanî heçku waliyê Tayip Erdogan be, di sala 2019'an de bêyî ku fedî bike wisa diaxifî; "Ti pirsgirêkên dewleta Tirk ligel Kurdên Rojava tine, yek pirsgirêk heye ew jî PKK ye."

Di salvegera dagirkirina Efrînê de li ser talîmata Erdogan, 3 sîxur û xayinên ji ENKS/'PDK' hatin derxistin li ser TRT-Kurdî. Wekî kewê gozel dixwendin: "Herêma Efrînê ev heft sal bûn di destê grûbên terorîst de bû. Li ser serê gel zilm dikirin. Tirkiyê karekî mezin kir. Ez gelekî spasiyên xwe pêşkêşî Tirkiyeyê dikim, bi taybetî jî ji bo leşkerên Tirk. Ji bo azadiya herêmê şehîd bûn. Dema ku Telebyat û Resulayn hate azadkirin jî em kêfxweş bûn.

Gelek rêveberên destekê didin dagirkeran û sîxurên ENKS'ê konên xwe li Enqereyê vedane. Yek ji van jî Îbrahîm Biro ye. Vî şexsî di nava ENKS'ê de navber bi navber gelek kar kirine. Di 21'ê Îlona 2020'an de dema endamê Komîteya Têkiliyên Derve yê ENKS'ê bû, TV yekî pêre reportac dikir. Li wê derê wekî ku dagirkeriya Tirkiyeyê meşrû bike, rewa bike wisa diaxive: "Hebûna PKK'ê li Rojava ji bo gelê me xetereyek e." anku rasterast ji Tirkiyeyê re dibêje, "li ser serê me belayek heye, were û cihên din jî bigire, me ji vê belayê rizgar bike.".

Rêveberekî din ê ENKS'ê wexta ku çeteyekî dewleta Tirk hatibû kuştin çûbû serxweşiya wî û li wê derê wisa propaganda dikir: "Dewleta Tirk di bin bangên Allahû Ekber de Efrîn ji PYD'ê girt û ev erd rizgar û azad kir. Mala Barzanî li Rojava bi navê ENKS'ê tevdigere. Ev malbat bi her çi navî hereket dike bila bike, di xizmeta MÎT'a Tirk de ye. Wekî rêxistineke girêdayî MÎT'ê li dijî însanên welatparêz û fermandarên QSD, YPG û YPJ'ê kar dike, îstihbarat kom dike û di encam de dibe sedema şehadeta bi sedan kesî/ê. ENKS, rêxistineke wisa ye, ji bo MÎT û Parastinê sîxur-ajan peyda dike, perwerde û biralî dike. Yê ku îstihbarat dide MÎT'ê û dibe sedema şehadeta Rêveber, kadro, welatparêz, xebatkarên Şoreşa Rojava, erdên genim lê çandî dişewitîne, sabotaj li ser saziyan dike, ENKS ye. Dibe ku hin kesên di navê de hatine xapandin û bi hestên Kurdiniyê cih digirin hebin lê di esasê xwe de ENKS, berpirsiyarê gelek şehîdên ku bi riya êrîşên firokên bê mirov, mayin û rêbazên cur be cur tên şehîd xistin e. Ne bes ev, herweha ew tovê xiyanetê yê ji Harpagos û Enkîdo, û herî dawî Mala Barzanî, wekî mîrasekî qirêj û gemar ku ji gelê Kurd re maye. Hewce ye were neletkirin û destpêkê ji aliyê hişmendiyê ve were tinekirin.



## ŞOREŞA 19'ê TÎRMEHÊ XETA ÇARESERIYA ALOZIYA SÛRIYÊ YE

**Dilyar Cizîrî**

Çend roj mane ku gelê Bakur û Rojhilatê Sûriyayê pêşwaziya salvegera 11'an a şoreşa 19'ê Tîrmehê bike. Di vê rojê de gelê Rojava ji Kobanê destpê kir û gav bi gav bajar, gund û navçeyên Rojava ji hêzên hikûmeta Baas rizgar kirin. Komên girêdayî dewleta Tirk ku li ser esasê xeta islama siyasî bi pêşengtiya tevgera Birayên Misilman xwe birêxistin dikirin xwe li wê gavê ranegirtin û bi êrişan xwestin asteng bikin.

Gelê herêmê bi serkêşiya YPG/YPJ'ê bi biryardariyeke mezin bi hêza gel parastina herêmê kirin û hemû cûreyên êrişan wan şikandin. Paşê dewleta Tirk a xwe li destkeftiyên şoreşê ranegirtin, êrişên cûdatir xistin dewrê. Êrişa DAIŞ'ê ya li ser Kobanê yek ji xelekên bingehîn ên êriş û planên dijberiya şoreşa Rojava bû. Di heman demê de navendên şerê taybet û hêza ragihandinê xistin tevgerê da herêmê ji şêniyên wê vala bikin. Planên wan heta radeyekê meşiyan û me dîmenên koçberiya komî temaşe kirin. Wan wiha texmîn dikir, bi wan gavên xwe wê dawî li şoreşa gel bînin û tevgera azadixwazan tune bike. Gelê kurd bi serkêşiya tevgera azadiyê di çarçoveya xeta sêyemîn de zemînek bi hêz a parastinê saz kir. Rê ne da komkujî di herêmê de çêbibin û di encamê de hêza biratiya gelan a li ser esasê piradîgmaya "Netewa Demokratîk" hate pêşxistin. Îro em dibînin di encamê de çawa gelê herêmê bi hemû pêkhateyên xwe rêveberiya xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyayê ava kirine.

Bi vê rêveberiyê zemîna bingehîn a çareseriya bingehîn a aloziya Sûriyayê ava kiriye. Ji ber wê jî di serî de dewleta Tirk, hikûmeta Şamê, Îran û Rûsiya yên li pey berjewendiyên xwe ketine û naxwazin bi tu awayî gelê Sûriyê bi aramî û ewlekariyê jiyan bike.

Ji ber wê jî plan û êrişên xwe li dijî Rêveberiya Xweser zêde dikin. Çi di aliyê leşkerî, aborî, siyasî û çandî de be, êrişên wan rojekê jî ranawestin. Her çendî di saziyên ragihandinê de behsa alozî û nakokiyan di navbera Rûsiya û Tirkiyê de tê kirin, lê tişta li ser lihev kirine, dijberiya Rêveberiya Xweser e. Ji ber wê jî bila em zêde bi nakokiyên di navber Rûsiya û Tirkiyê kêfxweş nebin.

Li aliyê din jî erêkirina Tirkiyê ya ketina Siwêd di nava NATO'yê de tê kirin. Her çendî Erdogan tevlîbûna Tirkiyê ya nava Yekîtiya Ewropa de wekî behane nîşan dabû, lê diyare Amerîka û welatên Rojava di mijara dijberiya Erodogan a bi kurdan re daye wan.

Li aliyê din jî di van deman de pêşwazîkirina salvagera sedî ya Peymana Lozanê dikin, Wê bandora naveroka peymanê û helwesta tevgera gelê kurd li rewşa tevahî Sûriyayê hebe. Ji ber wê jî di nêrîna min de wê ji niha û heta salvegera şoreşa 19'ê Tîrmehê dewleta Tirk, Hikûmeta Şamê û Rûsiya êrişên xwe yên li dijî herêmê zêde bikin û wê hewl bidin rê li pêşiya anternatîfan bigirin û wiha jî serweriya xwe biparêze.

Ji ber wê jî baldariyek mezin di kar û xebatên şoreşê de pêwîste, divê gelê me xwe ji rewşên herî giran re amade bikin.




# Rûpelek ji dîrokê...(2)

**Kakşar Oremar**

Bi derbasbûna sed salan ji wê peymana xwedî temenekî tije êş û elem hêjî em ferqekê di navbera kar û kiryarên Erdogan, Mistefa Kemal û Ismet Inönü de nabînin, lê dersên ku partiyên siyasî, rewşenbîrên civaka Kurdistanê û siyasetmedarên me ji wê bûyer û sed salên reş bistînin, çi ne? Mistefa Kemal beriya îmzakirina peymana Lozan di dema hevdîtina bi Kurdan re li peymanên Sîwas û Erzromê gelek soz û biryarên girîng bi gire-gir, şêx û axayên Kurd re parve kiribûn.

Di destpêka damezirandina Komara Tirkiyê li sala 1923an de, di 16ê Çile a wê salê de M. Kemal di hevpeyvîneke a bi rojnamevanan re vê daxûyaniyê dide: "Pirsgirêka Kurd yê qet nebe astengî li hember berjewendiyên me Tirkan. Ji ber ku wekî hûn jî pê dizanin, Kurd bi awayekî wisa bicîhbûne ku ew li hin herêman piranî ne lê ger em bixwazin pirhejmariya wan li wan dever û herêman kêm bikin û tixûbekî bikeve navbera me û wan de, wê demê em doza tirkîtiyê û dewleta Tirkiyê mehf dikin. Divê em wê demê tixûbekî di navbera xwe û wan de bikşînin heya digehe Erzirom, Erzincan, Sêwas û Xerpûtê jî. Heta divê em eşîret-êlên Kurd yên li çolên Konya jî berbiçav bigrin. Ji ber van egeran, li şûna fikrekî Kurdîtî ji xwe li gorî zagona me ya bingehîn, hinek mafên xwebirêveberî an jî otonomî ên herêmî yê bên sazkirin. Wê demê gelê kîjan herêm, dever an jî bajarî Kurd bin, ewê xweseriya xwe bi rê ve bibin. Ji bilî vê dema qala gelê Tirkiyê bê kirin divê Kurd jî



di nav de bêne hesibandin anku himwilatiyên Tikiyê bêne dîtin û hesibandin. Gava neyên an jî ev yeka neyên kirin û dîtin divê em li bendê bin ku Kurd yê pirsgirêkan derbixin. Niha Meclisa Mezin ya Netewa Tirkiyê (TBMM), ji nûnerên Tirkan û Kurdan pêk tê û van herdu gelan tevahiya hatin û paşeroja xwe kirine yek. Yanî ew dizanin ku ev tiştekî me û yên wan yê hevpar e. Ne di cî de ye ku mirov rabe tixûbekî cuda xêz bike û em ji hev bêne veqetandin…"(1) Ev gotin di belgenameya hejmara 1089an de hatine tomarkirin.

Xala girîng li vira ewe ku ew belge ji bo çi meremê dibe bila bibe, lê gelek rastî têde hene û dide nîşandan ku sazûmankar û birêveberên dewleta Tirkiyê yên destpêka salên damezirandina Komarê, di derbarê "pirsgirêka Kurd" de xwedî nêzîkbûnek zelal bûne. Hêza Kurdan dîtine û zanîne ku "Pirsgirêka Kurd" ji serdema Osmaniyan hebûye û yê Kurd nehêlin ew jî wiha rihet li ser serê wan xwedî desthilatdarî bin. Bi serhev de mirov dikare ji axaftinên Mistefa Kemal van rastiyan derxîne:


1. Divê ti tixûb di navbera axa Kurdistan û Tirkiyê de neyê kişandin..
2. Kurd li bajaren ku tê de bi piranî ne, yê bi awayekî otonomî xwe bi rêve bibin.
3. Dema ku qala gelê Tirkiyê bê kirin, Kurd jî yê têde bên bicihkirin.
4. Meclisa Mezin ya Netewa Tirkiyê yê ji nûnerên rêvebir yên Kurd û Tirk pêk bê.
5. Van herdu gelan di dirêjahiya dîrokê de berjewendî û paşeroja xwe kirine yek.
6. Dema ku Kurd weke netewe di nav gelê Tirkiyê de neyên dîtin an jî hesibandin, dibe ku nerazibûnên Kurdan herdem rû bidin.

Ev xalên ku ji aliye sazûmankarê dewletê ve hatine derbirîn ne hewqas kevn in. Lê belê ji bo jiyaneke hevpar, ji Kurdan jî hin hêvî hatin xwestin ku li hemberî hêzên Rojava yên ku axa Enedol-Mezopotamya dagir kiribûn şer bikin. Kurdan jî beriya wê li kêleka wan sherê dijberên wan kirin, lê dema hisab hatine ser masê êdî wan li cihê zimanê diyalog û logîkê dest bi tevkujî û sherê li dijî hebûna Kurd û Kurdistanê kirin. Xala herî dawiyê ku li pey sed salên temenê peymana Lozan divê bê gotin û qet neyê ji bîr kirin ewe ku cudatîyek bi qasî zere-misqalekê di navbera birêveberên Osmanî, Mistefa Kemal, Ismet Inönü, Erdogan, AKP-MHP de nayê dîtin dema ku mijara Kurd û Kurdistanê dikeve rojeva Kurdan û raya gishtî a cihanê. Ew weke bav-kalên xwe hê jî li ser înkarkirina Kurd û Kurdistan, jenusid û sherê bi shoreshgerên Kurd re



ne kirin, bes pishtre eshkere bû ku Kurd ji bo demeke kurt weke amaraz hatine bikar anîn. Dema peymana Lozan hatiye îmza kirin, hemû soz, biryar û axaftinên Mistefa Kemal hatine ji bîrkirin. Yanî ger demkî jî beJi Kurdan diberdewamin, lê êdî Kurd ne Kurdên sed salên berê ne. Destkeftên Kurdan biqasî ku pêwîst bin têr nakin, lê kar û xebat berdewamin û yê rojekê Kurd bigehin serxwebûn û azadiya xwe.( 1). Arşîva Dîroka Tirkiyê, hejmara belgê: 1089

## Nabe ku dagirkeriya Tirk bê rewakirin



**Zekî Bedran**

Rûsya, ji bo Tirkiyê bi awayekî li kêleka xwe bigire û bikar bîne di nava hewldanan de ye. Tirkiyê li ser bingehê dijminahiya Kurdan serlêdana Îsveçê ya ji bo endamtiya NATO'yê kiriye mijara bazarê. Rûsyayê fikirî ku dê Tirkiye bi NATO û welatên rojavayî ve mijûl bibe û destek da Erdogan. Rûsyayê jî li dijî Ukraynaya ku ketibû nava lêgerînên endamtiya NATO'yê şer dabû destpêkirin. Rûsya dehfdan nava alozî û şerekî ku dawiya wî ne diyar e. Erdoganê ku hewl dide li dijî Kurdan tawîzê ji Îsveçê bigire, dema bi Zelensky re hevdîtin pêk anî diyar kir ku Ukrayna endamtiya NATO'yê maf dike. Rûsyayê di vê mijarê de devê xwe venekir. Tenê di mijara Îsveçê de got welatên rojavayî zorê didin Erdogan.

Rûsya dê bi têkiliyên xwe yên bi Erdogan re pêşxistiye bigehe ku ne diyar e. Lê diyare ku bi van têkiliyan zirarek mezin dan Kurdan û Sûriyê û dê hîn jî zirarê bidinê. Rêveberiya Pûtîn pêvajoya Astanayê veguheran eniyek li dijî Kurdan û Rêveberiya Xweser. Kurd û Rêveberiya Xweser ji derveyî tevahî pêvajoyan girt. Gotin, "em yekîtiya axa Sûriyê diparêzin, hebûnên weke rêveberiya xweser ne rewa ne". Pir balkêş e, yên ku Rêveberiya Xweser ava kirine hemwelatiyên Sûriyê ne. DAIŞ ji herêmên xwe derxistin, li cihê ku azad kirin jî rêxistina xwe ava kirin û parastin. Bi hezaran kes di vî şerî de canê xwe dan, bi hezaran birîndar bûn û windahiyên mezin ê madî jiyan. Tişta ku ev rêveberiya xweser dixwaze ev e, di nava yekîtiya axa Sûriyê de pergalek demokratîk bê avakirin. Hertim anîn ziman ku amedene li ser vê bingehê bi rêveberiya Şamê re hevdîtinan bikin û pirsgirêkên xwe çareser bikin. Heman demê de li gel ku dizanin Rûsya rêveberiya Şamê destek dike û alîgire jî, pejirandin ku Rûsyayê bibe navbeynkar.

Li şûna ku Rûsya ji bo aştiya navxweyî ya Sûriyê bixebite û rolê xwe yê navbeynkariyê bîne cih, li Astanayê dagirkeriya Tirk rewa dike. Daxwaza demokrasiyê ya welatiyên Sûriyê ne rewa ye, lê dagirkeriya Tirkiyê rewa ye! Ev ji daxuyaniyê tê fêmkirin. Ji ber ku tu tiştek li ser bidawîkirina dagirkeriya Tirk nehat bihîstin. Ji bo bidawîkirina dagirkeriyê nexşerêyek an jî wextek diyar nehat diyarkirin. Ev tê wê wateyê ku dagirkeriya Tirk nayê nîqaşkirin û rewa tê dîtin.

Dagirkeriya Tirk tenê weke dagirkeriyekî nameşe. Amedekariyên tevîkirinê tên kirin. Hêza dagirker li ser axa Sûriyê bi dilê xwe tev digere. Bi hezaran hêzên çekdarî rêxistin kiriye. Li herêmên dagirkirî pereyê Tirk bikar tîne, dibistanan vedike. Bi hezaran mirovan bi pereyê ku ji Kuweyt û Qeterê digre li van herêman bi cih dike. Li herêmê tunekirina nîjadî çêdike, şêniyê diguhere. Malê gel talan dike, mirovan direvîne, bûyerên tecawizê nasekinin. Çi sûcên li dijî mirovahiyê hene dike. Dewleta Tirk van sûcên me jimartî bi awayek vekirî dike. Tiştên dike bes nabîne. Hertim di rewşa êrişê de ye, qetilkirin û reşkujiyên wî ranawestin. Zextê li Rûsya û DYE'yê dike, bazaran dike û hewldanên wî yên ji bo dagirkirina herêmên nû didome.

Berpirsên Rûsyayî ji bo têkiliyên Tirkiyê û Sûriyê asayî bikin di nava hewldanan de ne, daxuyaniyên bi vî awayî didin. Lê weke ku li hemberî asayîbûna têkiliyan astengek biçûk heye, ew jî rêveberiya Şamê dixwaze dagirkerî bi dawî bibe! Asayîbûnek çawa ye lê. Em heman tiştî ji bo Rûsyayê bihesibînin. Bila hêzek beşek axa Rûsyayê dagir bike. Zilmê li gelê wê bike, bi şêniya wî bilîze, li hemberî Kremlînê hêzên çekdar birêxistin bike û hwd. Gelo di vê rewşê de kesên li Kremlînê rûniştine dê têkiliyên xwe bi dagirkeran re asayî bikin? Wan bixe ji bo endamtiya Ukraynayê ya ji bo NATO'yê şerek di vê astê de girtin ber çav. Ev diyar dike ku nikarin li herêmên dagirkirî asayîbûnê bifikirin. Lê dema mijar dibe Sûriye, vê yekê li rêveberiya Şamê ferz dikin. Heman demê de vê di berdêla kişandina Sûriyê ber bi şerek din ên navxweyî de dikin. Herkes dizane ku, dewleta Tirk dijminê Kurdan e. Armanca wî ya destpêkê jî tunekirina Kurdan û jiholêrakirina Rêveberiya Xweser e. Tiştên li Efrînê li Kurdan tên kirin li holê ne. Rûsya ji herkesî zêdetir vê dizane. Di vê rewşê de gelo dê bi kuştina Kurdan razî bin? Gelo dê gelê Bakur û Rojhilatê Sûriyê dest ji destkeftiyên xwe berdin? Çima hêzên derve maf di xwe de dibînin ku biryarê li ser pêşeroj û çarenûsa gelê Sûriyê bidin? Ma ne divê Rûsya û Îran vê ji xwe bipirse? Tirkiye ne tenê li serê Sûriyê, li serê tevahî Rojhilata Navîn bûye bela. Di rastiyê de ne tenê ji bo Rojhilata Navîn, ji tevahî cîhanê re bûye çavkaniya xirabiyê û hatiye rewşek xeternak. Di vî alî de, di serî de gelê Sûriyê û cîhana Ereb li dijî vê çavkaniya xirabiyê hişyar bibin xwedî helwest.



## Peyamên nameya M.Hayrî Durmuş

**Farûk Sakik**

Nivîs û nameyên ji kadroyên pêşeng ên PKK'ê Mehmet Hayrî Dûrmûş ên ku li Zindana Amedê nivîsî bû, ji aliyê Weşanên Serxwebûnê ve weke pirtûk hat çapkirin.

Mehmet Hayrî Dûrmûş kî bû?

Ew kesê ku li hevrêyên xwe kiribû wasiyet li ser kevirê gora wî gotina 'Ji gelê xwe re deyndar ma' binivîsînin bû. Ew kesê ku di sala 1979'an de piştî ku li Qoserê dîl hat girtin, li dadgehan weke Endamê Komîteya Navendî ya PKK'ê parastina siyasî kir. Ew kesê ku ji bo dawî li zext û êşkenceya li girtîgehê bê anîn, ji bo mafê parastina siyasî bê dayin di 14'ê Tîrmeha 1982'yan de tevî 9 hevalên xwe Berxwedana Rojiya Mirinê ya Mezin birêxistin kir û şehîd bû.

Lê nameyek wî hebû 43 sal berê ya di 25'ê Mijdara 1980'î de nivîsî bû wek manîfestoyek bû. Digot: Hîn di roja destpêkê ya têkoşînê de min baş zanîbû ku rizgariya welat û gelan bi çend mehan, bi çend salan pêk nayê… Wisa jî bû.. Şoreşa Kurdistanê bi salan e dewam dike. Bedêlên mezin hatin dayin. Rêber Apo dîl hat girtin. Li ser wî tecrîdeke girankirî heye, lê ev tevger neqediya. Îroj hin kes hejmara êşa, salan û şehîdan didin û dibêjin ka çima azadiya Kurdistanê pêk nehat. Mehmet Hayrî Dûrmûş di nameya xwe de wiha digot; bi çend mehan bi çend salan pêknayê û behsa êşan jî nekiriye. Û her wek îroj dîtiye li ser rewşa îro jî nivîsandiye: Belê me windahiyên giran dan. Hîn jî em didin. Lê belê ne artêşa Tirk, ne xayinên wan ne jî mezinên wan empeyralîst wê nikaribin PKK'ê biqedînin, wê nikaribin ruhê berxwedanê yê gelê me têk bibin, têkoşîna azadî û serxwebûnê wê bi pêşengiya PKK'ê teqez bi ser bikeve.

Her wek rewşa Başûrê Kurdistanê ya îro tarîf dike. Li aliyekê êrişên mêtingeran û li aliyekê jî xayînên ku behs dike hene. Li dijî Tevgera Azadiyê şerekî topyekûn dane destpêkirin, lê bi ser nakevin. Bingeha vê têkoşîna ku Hayrî Dûrmûş û hevalên xwe avêtine wisa bi hêsanî têk naçe.

Lê di nameya xwe de girtina xwe wek bêşansiyekî pênase dike û divê ev yek li pêşiya têkoşîna min a aktîf bû asteng: Min dixwest hîn salên dûr û dirêj bi rengekî çalak têbikoşim, lê belê hatim girtin û dîl ketim dest. Ji têkoşîna çalak bêpar hatim hiştin. Ev yek min diêşîne.

Lê 2 sal piştî vê nameyê û van gotinan di wesayeta ji hevalên xwe re digot: "Li ser kevirê gora min 'bi deyndarî mir' binivîsin." Heger însanek canê xwe feda bike û hên jî xwe deyndar bibîne, êdî tu gotin nayê gotin. Bi tenê divê ku mirov bifikre li hember helwestek bi vî rengî em dikarin çiqas tevlî vê têkoşînê bibin. Ew li hember gel xwe deyndar bibîne divê ku em jî li hember wî xwe deyndar bibînin. Tevî hevrêyên xwe li Kurdistanê geriyam û min pirsgirêkên rastî yên gelê me û welatê me rast fêhm kir…Min hewl da ji gelê xwe re vebêjim ku berpirsyarê van pirsgirêkan hemûyan mêtingerên Tirk û xayînên Kurd ên xulamên wan in…

Ev peyva 'xayînên Kurd' divê baş were analîzkirin. Di her serdemî de kesên wiha li pêşiya azadiya Kurdistanê bûne asteng. Ji bo ku vî aliyên xwe yên xizmetkirina ji dijmin re veşêrin, di bin navê rexnekirinê de bi awayeke bêexlaq êrişî Tevgera Azadiyê dikin. Ji wan re qada 'Medya Dijîtal' jî vebûye. Ew û trolên dijmin bi hev re ji navendekê êriş dikin.